

Belavok derbarê parastina tamîna berpirsiyar ji bo xwedîker û serwerên xwebexş

1. Dema ku tu wek xwedîker (Betreuer) tê erkdar kirin – tu yekser bêy ku tu daxwiyaniyan bidî – tamîna te çêdibe. Tu dikevî nava tamîneke giştî û bi vî awayî tê parastin. Ev tamîna giştî li gorî peymanê hevbeş di navbera wezaretê Niedersachsen û banka Landschaftlichen Brandkasse Hannover hatiye girêdan. Helbet heger tamîneke te ya din hebe, ev te tamîna hatî behs kirin ji te re ne misogir e, anku heger tu ji berê de weku karmendê komeleke xêrxwazî ji bo xwedîkirinê yan karmendê dezgeheke dewletê ji bo xwedîkirinê yan heger tu bi rengekî fermî xwedîker bî, wî çaxî ev tamîna hatî behs kirin ji te re ne misogir e. Ev tamîn ji bo wan zêraran e yê ku tu di heqê wî insanê pêwîstî alîkariyê de bikî yan jî ji bo wan zêraran e yê ku dikin werin serê te seba parastina erkê xwedîkirinê ji bo kesekî din. Her zêrerek ku ew kesê ku ji şûna te ve kar dike pêk bîne, ev tamîn te û wî jî diparêze. Ev parastina te ji aliyê vê tamînê ve te her wekî din jî li beramber heq û huquq û daxwazên merovên te û kes û karên te jî diparêze, eger ev kes ji aliyê te ve di heman xanî de bê xwedîkirin û guhdan.

Tiştên di çarçoveya vê tamînê ne tamîn kirî, tamîna şexsî yan berpirsiyariya qanûnî ya kesê pêwîstî alîkariyê ye. Merov dikare ji bo vî hawî tamîneke şexsî cuda girê bide.

Heger Dewletê alîkarî dabe te û bixwazibe vê alîkariyê careke din ji te bistîne, tu ji boy vê mijarê jî di çarçoveya vê tamînê de parastî yî.

Ev hijmarên jêrîn yan **qîmetê pereyên jêrîn** di çarçoveya vê tamîna giştî de peyda dibin:

- a) ji bo zêrên milk û mal – tamîna ji bo berpirsiyariya qanûnî 250.000 EUR serê her dozêkê
- b) ji bo tamîna giştî ji bo berpirsiyariya qanûnî 1,5 Mio. EUR bi giştî ji bo zêrên di heqê kesa de û milk û malê kesekî de

Ji te nayê xwestin, ku tu beşekî ji van pereyan ji cem xwe bidî.

Tiştên ku di çarçoveya vê tamînê **mayîn** parastin ev heq û huquqên jêrîn ne, sebare

- a) Zêrên çêbûyî ji ber karekî hesabdarî bazirganî yan karekî spekulasyonê yan karekî rêxistinî.
- b) Zêrên ku çêbûyî ji ber ku peymanên tamînê nehatine girêdan yan ew peyman bi rengekî ne yasayî hatine girêdan yan nehatine pêkanîn yan nehatine berdewam kirin.

Lê helbet ew zêr tamîn kirîne, yê ku ji ber wê yekê peyda bûne, ji ber ku kesê xwedîker ji bîr kiriye ku tamîna bijarte ya nexweşî jî bo kesê pêwîstî xwedîkirinê çêke.

- c) Zêrên ku kesê tamîn kirî bi rêya bi kar anîna terembêlekê yan erebeyekê çêkirine.
- d) Zêrên ku meqûd hatine kirin.

2. Heger kesê ku tu wî xwedî dikî yan kesekî din ji boy xwedîkirin û guhdanê pêwîstiya wî ji bo berpirsiyariya tamînê bi te çêbû, divê tu vî tiştî yekser ji bo vê navnîşana jêrîn ragehîni, taku tu zirar yan kêmasî negihîjin te:

Landschaftliche Brandkasse Hannover

SD-H-3,

Telefon (0511) 362-1613

30140 Hannover

Divê tu belgeyeke pêbawer ji aliyê dadgeha elaqedar ji bo karûbarê xwedîkirinê pê re bişînin yan piştra bişînin, ku isbat dike, ku tu jî ji wan kesan î yên ku di çarçoveya tamîna giştî de tamîn kirî.

Tu dikarî ji şûna vê yekê jî, heger qeza çêbû û te xwest ji bo şîrketa tamînê ragehîni, tu dikarî wê qezayê ji dadgeha elaqedar re ragehîni û ji dadgehê daxwaz bikî, ku wê qezayê û tiştên girêdayî wê ji şîrketa tamînê ya Landschaftliche Brandkasse Hannover re bişîne. Lê helbet divê tu vî tiştî di zûtirîn wext de pêk bîni.

Hemî qeza yan zirarên ku bînin kirin û te ji bo wan peymaneke din ya tamînê li cem şîrketekê din girêda be, divê wî çaxî tu wan qezan rasterast ji bo şîrketa tamîna xwe ragehîni bî ku tu berî hingî ji boy dadgeha elaqedar re bêjî.

3. Mesrefa vê tamîna ku wê ji boy te were çêkirin pêşî ji te nayên standin. Heger ew kesê ku tu wî xwedî dikî ne feqîr be bê çare be û ji ber vê rewşê tu nikaribî mesrefa xwe ji xezîna dewletê bistî (§ 1835 Abs. 4 BGB) şîrketa tamînê mafê wê heye û dikare mesrefa salane ji bo tamînê di demeke din de di paşerojê de ji te bistîne.

Li gorî qanûna xwedîkirinê (Betreuungsgesetz) bi yasayî hatiye danîn, ku mesrefên beraqil yê tamîna berpirsiyar ya xwedîkerê (Betreuer) ji wan mesrefan tene hesab kirin yê ku li gorî qanûna bingehîn ya almaniya §§ 1835 Abs. 2 S. 1, 1908i BGB dikarin li wî bêne vegeandin yan ji şûna wî bêne dan.

4. Heger tu berpirsiyarê milk û malê wî kesî bî yê ku tu wî xwedî dikî, wî çaxî divê tu tamînekê (sîgorta) ji bo wî milk û malî re girê bidî. Mesrefa beraqil ya tamîna berpirsiyar dikare ji milkê wî kesî were dan ew kesê ku tu wî xwedî dikî.

Tu azad î, tu dikarî li gorî dilê xwe şîrketekê tamînê hilbijêrî û tamîna berpirsiyar girê bidî. Lê em dixwazin bala we bikşînin ser wê yekê ku derfet heye, ku hun karibin parastina tamînê ji bo behayekî bilind girê bidin, ji ber ku berî neha peymaneke giştî bi Landschaftlichen Brandkasse Hannover re hatiye girêdan.

5. Parastina ji bo tamînê di çarçoveya tamîna giştî bi dawî tê

- eger xwedîkirin li gorî biriyareke dadwerî hate rakirin,
- eger xwedîker ji erkê wî hate dûr kirin yan heger ew mir,
- eger kesê ku tê xwedî kirin mir.

Têbinî:

Eger kesê ku tê xwedî kirin mir, wî çaxî karê xwedîker û erkên wî bi dawî tên. Veşartina kesê mirî û birêvebirina mîratê kesê mirî ne wezîfa xwedîker e, lê karûbarên pêdivî, ku paşvedana wan wê bi zirar be, dikarin bêne encamdan, heta ku xwediyên kesê mirî bi karûbarê wî rabin û tiştên pêdivî pêk bînin.

6. Ev tiştên li jor hatînin bi rêzkirin di esasê xwe de ji bo serweran (Vormund) jî misogir in. Dadwera karûbarên malbatî berpirsiyar e.

7. Ji kerema xwe re ji bo standin agahdariyên berferhtir serî li van cihan bide

1. wargehên VGH yên herêmî

Yan berê xwe bide

2. Landschaftliche Brandkasse Hannover

IH 2,

Telefon (0511) 362-3889

30140 Hannover.